Mihemed Hemo

# Di kûraniya vê riyê de

**Di kûraniya vê riyê de**
**Helbestvan: M.Hemo**
**kumputer: Hêdî  muhemed**
**Derhêner: Xebat Şêxo**
**Motîv: Felkdîn Emîn**
**jimar: 1000**
**sal: 2004**
**jimara spartin (197) li wîzareta rewşenbîrî ya Kurdistanê.**
**Ji weşanên dezgeha Xak Silêmanî.**

*Diyarî*

***Ji bo ya ku xemên min bi xwe re parvekirine***
***zîndan bi min sivik kirin e***
***Dostitrîn hevala rê***
***Dildar û hevmala min Yildiz***

# Gotinek ji dil

Ji zanayekî pirsîn : kîjan kurê te li ber dilê te buhatire ..? got: (( yê biçûk ta mezin bibe , yê nesax ta sax bibe û yê li dûriyê ta vegere ))
Gava me ji helbestvan Mihemed Hemo jî pirsî buhatirîn berhema te kîjane , got: ew berhema ku min ji nav tariya zîndanan revandî û ya di nav de mayî û ew berhema ku dikim binivîsînim û hîn min ne nivîsandî ye .
Xweş dizanim ku her rûpelek . . . her helbestek vê berhevokê, ji can û jiyana M.hemo ye , ew jiyana ku bi canê mirovatî bi keser , êş û evîna welat strayî ye .
Karî bi hunera helbestên xwe canê gelê xwe yê evîndar û azadperest têrbikira .
Ev berhema Mihemed Hemo , wek: navnîşana wê ye ( di kûranira vê riyê de ) . . . gulistanek cîhanî ye , berhemeke bi bere, kare di nav berhemên cîhanî de bijî .
Di kûraniya vê riyê de , riyek cudaye panorameyek jiyanê ye , dayîk , hevmal , dîlbere, zîndane, azadiye , surişte , xudaye, evîn û êş e.
Dibêje: dayîka min ya ser bi dûman . . . bi melûlî bi perîşanî , bi ken û girî , temenê xwe sipart agirê jiyanê , perestgeha Zara geşkir , ez ronahî dam !
Cawa ezê resiva zîndanan venemrînim ?!!

Ev berhema Mihemed Hemo hulma zîndanê ye , hawara cîhanê ye , her rûpelek jiyaneke ji bilî wê hemî jî Mihemed Hemo ne tenê helbestvane şah siwarê rewşenbiriya kurde , cara yekê bû pirtûkxana kurdî (Bedirxan) di nav rijêmeke şovenîst de damezirand û li ber zilm û zora wa rijêmê berxwedankir , ta ew pirtûkxana Bedirxan kir rodanka rewşenbîriyê .
Mihemed Hemo bi xwe jî berhema wê pirtûkxanê ye, karî di reşiya zîndana de ronahî bida û tariya zîndanan vemiranda .
Hêvîdarim em xwe di (( kûraniya vê riyê de . . . )) bibînin , gotinên ji kûraniya dil derê , wê di kûraniya dilan de bi cih bibin .
Kurmanciya pîr dibêje : ( gotinek xweş buhara dila ye ) .
Demek rengîn ji hemî dilovan û evîndarê gotina xweş re dixwazim bimînin di xweşiya kûraniya vê riyê de .

*Nûredîn Japo*
Silêmanî
9/11/2004

# Dîsa

Ji bo girtiyê di zîndanan de berevanê rewşenbîriya kurd helbestvan; M Hemo
Jandost
Berçele 1999

Dîsa tu birînên xwe
bi xwêya zindanan dikewînî...!
Dîsa tu awirên xwe
di katjimêrê de dimeyînî...!
Dema kenê zarokan
di bîra xwe tînî
Neçare li dilê xwe yê


hişyar guhdar dikî
Reşayî ji ban diniqute
Bêdeng weke helbestekê !!
Dîwar bi şerm
        li çavên te dinêrin
Tu jî bi awirên xwe
        yên xulmaş
Xewnên xwe
li ser wan dineqişînî !
Sarin şevên çiriya paşin
Sartirin şevên kanûnê
Sersal bê ŞAHÎ* diçe

De rabe
êzingên peyvan
        ji çola xeyalên xwe
        bicivîne !
Newroz tê
Helbestekê vê şevê vêxîne !!

* Şahî: navê keça helbestvan e



# Dayê ...!



## Dayê ...!

Dawiya tevna giriyê te
nehat
bi dirêjiya tîrêjên rojê ye
bêhijmar
te nexşên kul û êşan
lêkirin e
Ma tu yê diyarî kîjan
mizgeftê kî
diyarî kîjan
keniştê kî ??
û li ber lingên kîjan
meleyî û metranî raxînî ?



Te tevna giriyê xwe
xemilandî
bi nîgarên gilgazincî...
wê di mista terezûna
kîjan dadê hilê ...?
Mişte ji histiran
emê bi ber tîna tava
dilê kê din ?

***2001***
***Heleb***

# Kûraniya vê riyê






## Kûraniya vê riyê

Bi sîng ketime kûraniya
vê riyê
ev riya ji kûraniya sîngê min
bi der nayê
kûrtir e ji kûraniya singê min ...!

Di kûraniya vê riyê de
xem xeman xudî dikin
êş xwe dispêrin êşan
gav ji gavan şerm dike
βι xemsarî

yek li pêy yekê diçe
dil bi cih nabe, nabe
Çurûk, çurûk
Çav li vegerê ye
ev çi xewne...?!
nizanim... nizanim.. na...!
Xewnek kûrtir e
ji kûraniya vê riyê !
diyar nîn e ku divê riyê de
gav demê dixapînin
yan dem gavan dixapîne ...?!

Gav û demê
wek min binvîs dibin
tenê rêçikên demê dimînin
û zindî di kûraniya vê riyê de
bi dawî nabin !



Çendî mirov nanxure..?
Lê di kuraniya vê riyê de
nan serê mirov dixwe ... nan
loma neçar e neçare
ramûsan di dilê dildaran de
celq dibin
û lêvên dîlberan
beyar dimînin..!!

Di kûraniya vê riyê de
hêvî bi piraniya stêrkane
lê baskoyî ne
sînorê mijê kela girî
nabrin
ji ber barana dildariyê… !!

xwe disipêrin binkonê şermê
ronî di çavên dildaran de
ziwa dibe
û nagehînin ber roniya
stêrka xwe
ta ku di gerdenê sîwana wê de
xewnên xwe
şirovekin...!!!

***Silêmaniyê***
***2002***



# Tawanbarim

Tawanbarê dadgeha te me
Tu xeman hişyar dikî, tu
Tu xeman Lele dikî, tu
û xewnfiroş jî, tu ye
tenê tewan bar ez im
tawanbar ... bar…!
Dizanim nikarim
pî di piyên te re kim

Wek; Reş û sipî
Wek; Ba û baranê
û te ji devê pariyê
nên bikşînim
ji wê koletiyê rizgar kim
û bispêrim canê hozanekî
di nav hestan de veşêrim
nazik , nazik
ciwan , ciwan
xudîkim !!
Bi lorandin
bi hêjandin
hêdîkim…



ji ber
dizanim
tawanbarim
tu jî , dadwer э
bê parêzer , û berevan
di dadgeha te de
têm dadan ... dadan…!
Nizanim
bi çi yasayê,
tawanbar im...?

***Silêmaniyê***
***12-10-2002***

## Helbestvano !






## Helbestvano !

Dîwarên rojnedî
ku ronahiyê nasnakin…
banên binzemînî
ku qedrê serhildanê
nizanin...
û deriyên rûzingarî
dikarin  bi helbestvanekî
çi bikin !?
Ji bilî helbestek zelal
ji dil û hestan biher kînin !!

***28-8-2001***
***Zîndanek Heleb***

# Ser sala du hezarî





## Ser sala du hezarî

Sersalê..!
Bê tidarek
bê vexwandin
bi xwîngiranî
  tu li me dibî
        μêϖαν...!
Em ji te re
        çi pêşkêşkin..?
Tu yê, bi van dîwarên
        rûneşuştî re
        goştê me bixwî ?

Bi van şîşên zingarî re
gulîlkên çavên me bikolî
û hestiyên me bimaşî?
Tu yê
Alafa govdeyê me di girtîgeha
rijêman de vemirînî ..
Û kulîlka dilê me,di girtîgeha hêviyan de
vejinî ?
Bizanibe;
Her ku mirin dadiqelize
canê me
em bi agirê evînê

tên dadan !
Di nav lepên reşiyê de
xweşiya ronahiyê dibînin !
Di nav tiliyên zorê de
helbesta azadiyê dinivsînin…



Û serbest, bi êşn xwe re
dijîn…!!
Ey mêvana xwîngiran...!
Em bi destê kê nanê te
bistirên. . .
û tenûra nêza te ar kin...??
Taştiyek êşa pêşkêş kin…
Ta ku firavîneke xweşiyê
amade dibe...!
Em dizanin
bi melyonan birçiyén azadiyê
hene !
Lê em di vî welatî de
tîyê stirana azadiyê ne
girtiyê giriyê azadiyê ne..
Ey sersala du hezarî
kanî soz û peymanên te ...

***1-1-2000***
***Girtîgeha - Heleb***


# Hevmala min -1-

*Ev helbesta berê di berhevoka min (  Seyrana dil, di şîna evînê de) belavbûye. di zîndankirina min î dawî de min Hevmala du û sê jî nivîsîn. loma min hez kir ku her sê bihev re di vê berhevokê de, bên weşandin.*

Hevmala min
Sergovenda xweşiya dil
  Haya te jê heye ?
   di van rojên mirdar de
            ro li nîvê ezmên
                  û qet, danagere ?



# Hevmala min -1-




û qet, danagere ?
Dilê bengîn û bi evîn
Diprpit e
Pêlên xwînê lê dixîne
Co û sulavan diherkîne …
xwe nagire
di cihên teng û genî de
xwe li dîwar û bana dixîne
û difire
Wek; Kevokek teqle
di ezmanê welêt de
teqle teqle dizîvire
baskan li hevdixîne
xwe berdide
ser bajarê evîna min û te…
ji hêlîna bîranînan
namê li ser namê
Ji min re tîne
û çare nîn e ... !!



Hevmala min !
Kulîlka jiyanê !
Li vî cihî ...
Ehrîman kenê xwe dike
Ahûramazda gazî û hawarên
Xwe dike
Livî cihî ...
dijwarî xemla xwe girê dide
xweşî biskên xwe dibre
Her tişt lê bindest e û giriftar e !
Lê xewnên vir xweş û serbest in
ne wek xewnên mal in

Hevmala min  !
  Gava ez li mal bûm
            li ber bihna te
               xewê didam
           bin basikên xwe
           li ser min lûs dibû…!
Di xewnên xwe de,
  diketim ber destê neyaran
  diketim nav koma maran
  dibûm mehkûmê dewletan
  dibûm dêndarê mixenetan…!
lê gava çavên min
  wek: gupikên binefşan
            bi berbanga sibêre
                   dipişkivîn..!






Min li dora xwe dinêhêrî
ez î li cihê fîtfereh ...
li ber bihna kulîlkên xwe
li ser textê siltanîy; . . .
wê hingê
xewnên bi tirs û saw
direvîn ji hişê min …
tava xweşiyê, xwe berdida.
ser canê min…
Lê li vê derê;
li benda şevê dimînim
ta xewnên xweş bibînim
dikerisim, ji hal dikevim
ta ro di xewa xwe de
tol dibe pişt deriya
şev bi ser min de tê…



Serê xwe
li ser solên xwe
datînim
laşê xwe
li ser erdê hişk û lihêmî
radixînim
çavên xwe,
di katjimêréde
dimeyînim…!!!
Katjimêr
bê şerm û fedî
diçavên min de
dide xewê…
û nema xewa min tê
dibe xezala çiyan
ji ber min baz dide…!!






didim dûv
di nav rez û zeviyan re
di dehl û çiyan re
di geliyekî kûr de
li min dibe marekî reş
xwe li bejna min dalîne
hulma xwe
bi ser min de dikelîne…!

Di xewna xwe de
dikevim nav şoreşgeran
dibim mêvanê hozan
û perweran ...
temiriya xwe şedikim,
simbêlên xwe badidim
di reşikên çavên te re…
lê gava çavên, min
wek: berûyên, di agir de
diteqin ...!

Li dora xwe mêze dikim,
Çar dîwarên rû reş,
û banê biqirêj...!
Çavan berdidim katjimêrê
dibînim teqlak daye xwe
cihê xewê xweş kirî....!
Dibêjim hey w... a... x... wax
Şevên min jî mirdar in !
Kurmên xewê
ber çavên min dikin...!
Bijangên min
Ji hev dûr dimînin
Dibin; Partiyên me
rûreş dibin
berhev nayên...!



Şal û şapikên baweriyê
ji ber hev dikevin
ewrên reş û tarî
heyvê vedişêrin
stêrkan dipeçinin
rê û delav winda dibin . . .

Berê xwe didim
Çirûska çiyan
bi rê dikevim
hespê hêviyan vedilukume,
Jê de dikevim
pişta min diderize
dilê min ditevize...

vîna Apê Osman
Pişta min rast dike
xwîşka Leyla Zana
dibe teyaqa dilê min
Ji nuh ve hişyar dibim
bêçare dimînim . .

Hevmala min
Xemla hêviya
Di navbera malikên pilindir re
di ser kufika banê re
li fîncana xwe sedikim…
vêre, pêre
di zevîyên buhara te de
şevînê dikim ... !



Di riya şevînê de
dikeve dilê min
tirsa dijmin û neyar
dikeve dilê min tirsa cinawir
ϖαν kûçikên me yên har …


Lê vêre
tu dibî
arika şevînê
hêdî hêdî çira xwe
vêdixînî û vedimirînî
şev û rojên mirdar
bi ganve tînî
govenda xwe digerînî
digel kulîk ên şevînê ...
bi ser min de berdide
bihna hêvî û evînê

Hevmala min !
saza evîna dil !
Bila hîvî nemirin ...
bi sedan zana û hozan
siwar bûne li pênûsan…
Bila hêvî nemirin
Hîn jî tê me
dengê Perweran…
Bila hêvî nemirin
nêzîk maye
bibin kavilin rûreş
ev zîndan...

***Zîndana Şamê***
***1995***



## Hevmala min -2-



## Hevmala min -2-

Hevmala min
Xemrevîna dil !
Her ku derî
min dihavêjin pişt xwe,
û dîwar di reşiyê de
li min tên hev… !
Ez lê hay dibim
Çawa dîwarên malê jî,
di reşî û ronahiyê de
li te tên hev…!
Malê
li serê te teng dikin
şev û rojên te
tevlihev dibin
dirêê;j dibin
û ji hev dernakevin…



Hevmala min,
em ji hev dûr in
lê ez bawer nakim…
Ticarî
dîwarbend û dûrgeh
karibin di navbera
dilê min û te kevin…
va di pişt deriyên hesinî de
di nav lepên reşiyê de…
Her ku
te bi bîra xwe tînim
tirkinî bi dilê min î, evîndar
dikeve
xuminiya ewran dide
birûsk ji ber derdikevin
ezmanê evîna min û te
ronahî dikin
û tavên biharê
bi ser gulistanên jiyanê de
dibarînin…

Hevmala min !
Di vî welatî de
ne dewlemend û perelî me
        ku dîwarê xwe bilind bikim
ne kêm û bêrûmet im
        ku ji rijêman re koletiyê bikim
ne tuneyî û bêçareme
        ku ji tirsa stiriyan re
        xwe ji gulan mehrûm bikim…
Di nav vê rijêma şovenîst de
                    ez çi bikim ?
Divê di zîndanan de
    şerê leşkerên Ahrîman bikim
        û şûrê xwe bilind bikim!
Di nav vê rijêma şovenîst de
   ne li zîndanan be
                    li ku derê




ezê wijdanê xwe vehesînim ?
Ger ûjdanê min ne vehesî be
        li kîjan koşkê
        li kîjan qesir û qonaxê
  ez ê xweşiya xwe bibînim
Bi çi rûyî
  ala azadiyê hildim
  rewş a welatê xwe
          bixemlînim
Dayîka min
        ya dilovan
Dayîka min
      ya ser bi dûman…
  bi melûlî bi perîşanî
    bi ken û girî

temenê xwe
sipart agirê jiyanê
Perestgeha zara geşkir
Ez ronahî dam

Çawa
Ez ê reşiya zîndanan
venemrînim ?!!
Zîndanek çendî reş be
ji qesrek kole geştir e !
Zîndanek çendî teng be
ji komarek bindest ferehtir e  !
Hevmala min !
Îro ji te dûr im
tirsa min e
ku tu di dû min re





li şahî û şadîmanan
amade bibî
û têde strana ( lo xalo lo xalo )
bêye stran
wek stêrkên ji ezmanan
dirijin
bi paniyê rûyan
histir ji çavên te
werin xar..
Wê hingê
Tu yê leşkerên Ahrîman
li min rakî
Reşiyê li min hişyarkî ...!
Zîndanê li min teng bikî



Hevmala min !
Xemê min li xwe ne civîn e
Tu xemrevîna min î
xemla xwe girêde
serê xwe bilind bike…
destmala ku tu dikî
Pê histirên xwe vemalî
Pê serê govendekê bigir e
û şahiyekê li darxîne
Ji strana ( lo xalo lo xalo)
bawer neke !
Ticarî
dest di kelepçekan de narizin
lê kelepçek
di destên helbestvanan de
dirizin
û helbestvan helbestên xwe
dirisin… !


Hevmala min
Peyxema evîna dil
  Bipirse ji Nazdar * xanimê
      Ku helbestvan ji kîjan axê
                  hatine stran . . .
û  jêre bêje
     Ji ber bihna kê
     can pê de hatine berdan...?

***Zîndana Heleb***
***31- 9 -1999***

*** Nazdar: jinek ji Silêmaniyê ye. Hevmala Helbestvan Qubadî Celî zade ye. wê pêşgotinek ji helbestên Qubad re nivîsandiye û tê de, ji hemî hevmalên helbestvanan re, dibêje: " divê hûn bizanibin helbestvan ji axek taybet in "**



# Hevmala min -3-



## Hevmala min -3-

Li pişt şîşên hesinî
Di navbera têlên bêjingî re
Min raz û dosiyên
Çavên te xwendin !
Ez jê hay bûm
Ku berî


Adem û Hawa
Ji buhuştê bên avêtin
Buhuşt di nav bera hev de
Parvekirin



Adem
Koşk, Gulistan, piyal,
û serfirazî
xist dilê xwe
Hawa jî
Kulilk, Meywe, Mey,
û ciwanî
xist dilê xwe
Her ku dilê
Adem û Hewa
dibin yek
Buhuştek nuh ava dibe..

***Girtigeha Heleb***
***7-1-2000***

# Jiyan kwîr






## Jiyankwîr


Min serê xwe hilda
Pêjna du sê melyonan
xuyakir
Argûnê rastiyê ronahî da
min dît,
Pirên wan mirî ne
û leşkerên Ezraîl
Pêşewaziya canên
wan nakin…!!!

Çinkî,
neketine perestgeha agirê pîroz
û canê xwe
bi alafa agirê jîyanê
neşuştine
û li ber wê ronahiyê
rûneniştine…
Loma
laşên wan bûne
gora canên wan … !

***Girtigeha Heleb***
***19/11 /1999***



# Dildarî



Du mîr in
du kole ne !

Di çilpikên xunava sibê de
  lêvên guljiyanê şil dikin
  kefenê mirinê diçirînin ...
  bi bêhna gulan re hildifirin ...
    di dawînîna banî de bi cih dibin...!



Du têr in
du birçî ne !

Di peyala meyê de
  li ser lêvên helbestvanan
  sirûda evînê dixwînin
  can bi evîndariyê tînin ...
    di siya Yezdan de rûdinin…


Du fermandar in
du girtî ne !

Di redeka sîngên hev de
bilind bilind difirin ...
ji ezmanê ezîniyê
rizgar dibin
di dilê evîndariyê de
bi nimêj û sema
rojê
hembêz dikin...



Du guldank in
du mûmdank in..!

Di xwîna bilûrekê de
dikelin û pêl didin...
taç û gerdenan melûl dikin
can şiyar û bilind dikin...
di dilê Ejdîyar de
bi cih dibin...






Du kenok in
du girînok in !

Di histirên dayîkan de
Pirsan peya dikin…
bi kenê zarokan
bersivan siwar dikin …
bi ciwaniyê berxwedanê
dikin...

Du pirs in
du bersiv in !


Di peyxema pêxemberê
evînê de
bi razên dil kulîlk didin
bi şepaliyê ronahî didin
ji windabûnê rizgar dibin
di sirûda azadiyê de
saz dibin...!!!



Du agir in
di argûnekê de tên dadan
du can in
bi agirekî tên şuştin
du deng in
li geliyekî deng vedidin
du çiyanin
di kirasê berfekê de dikelin !!!
Du deriyan
du berî ne
du stêr in
Pir ji hev dûrin
di nexşa bîreweriyê de
ti dûrgeh di navbera wan de
nîn e...!

***Girtîgeha Helebê***
***1-3-2000***

## Dilyar






## Dilyar

Bêyî mûma dilê xwe
ne li ber ronahiya çiran
ne jî li ber ronahiya rojê
nikarim rûpelekî
ji rûpelên evînê
ne bixwînim
ne binivsînim !!

**Helebê**
**2000**

Efrîn . . .!





Efrîn ... !

Guljiyana dil
Tu
Ramûsana dildara yî
roj ji rojê
di dil de
reng vedidî...

kela dilê dîlbera yî…
her dem
di cîger de
kel didî ...

Tu
Paşla ciyayên rengînî
bi kaniyên ava jînê
tîbûna Ferhad
û Dicile
dişkînî ...


Efrîn ...
Ne bi ava te be
agirê tîbûna welatê min
wê bi evîna
ava
kîjan çemî
vemire… ?



Efrîn ...
Ne zanim
tu dayîk î...
ne zanim
tu yar î ..

lê di zanim
bêyî pêsîrên te
najîm
û jiyan nabim ...!?

# Şahî..!






## Şahî..!

Şahîka min
hulma dayîka min
xunçeya dilê min
Pêmpulîka buhara min ...

Piştî ku me delavên êşan
li şûn xwe hiştin...
Min got:
Ez ê navê keça xwe
bi Şahî kim
bi evîna welat
xudî kim

bi agirê Newrozê re

bi bûk kim ...

Min qet nezanî

Çemên êşan gergîn


li benda me ne

Wê min ji berçavên te
bigrin
û berdin gola reşiyê
dilê te yî biçûk ... biçûk
bikin embara xem û êşan !?

***Zindaneke Helebê***
***11-10-1999***



# Hunermendo !



## *Diyarî*

***ji bo giyanê Hunermend***

## *Ebdilrihman Dirêhî*

### Hunermendo

Gav bi gav
hingên bîranînên te
di bîreweriya me de
hingiv didin…!
Ji vingvinga wan
sazê bilûrek navsalî dikim
û awazan diçinim…!



Ji qamûşekî şekirî
li ber lêvên çemekî
ji çemên hestên min
şîn daye ... !
Ji zelalbûna ken û giriyê
wî çemî…
bi awazin li hestan
sîwar bûne
li saz dibin...
bi heft çavên xwe
li ser te dide girî
û bihin lê naçike…!


Rabe hunermendo rabe
bi tiliyê xwe yên mişthest
histirên vê bilûrê
vemale…!!!

Keriyên êşan
ji hinavê me
berde
zozanên dil bilindin
deşt fere ne ...
li sazxe vê biharê
bi awaz û fîxanên
bilbilan re …
bixemlîn e
bi semayên pênpilûkan
digel gangilî, beybûnan
û binefşan…

gundê Maratê
***Hizêran 2001***



# Xuda !



## Xuda !

Gava
te heriya Adem
histirayî
ka tune bû
yan te bîr nebir
ku pê bistira…?
ta temen dirêjtir ba..!




Xuda !
Ew agirê çı bû
te jê Îblis afirand
ta niha venemiriye ... ?!

xuda !

Ew sêva Adem
xwarî
buhayê wê çend bû...?
Ta niha deyndarê
Te ye...!

***silêmaniyê***
***4-10-2002***

# Birîn







# Birîn

Ger birînên evîndaran
bi derziyên tîrêjên
çavên hev
neyên benckirin
û bi ramûsanên hevdu
neyên durûtin ??…

Hekîm û nijdar
wê çi çarê lê bikin ?!

***Beyrot***
***2001***

# Tenyahî






## Tenyahî


Ji dûriyê reviyam
hîn bi dûkr ketim
kerwanê tenahiyê
dam nav xwe
li hespekî kwîr
sîwar kirim
bi dahola xeman
Pêşewazî kirim
di dehla kulan de
li koşka koçberiyê
peya kirim !!!

Stêrk cîran in ker bûn
  heyv yarek lal bû
 dema xwîngiran
   mêvanek temenxur bû ... !
Tenûra wê venedimirî
   li ber arvanê jiyana
                    min girtibû
  û şev û rojên min
                  dibraştin ... !

***Avdar***
***2001***



# Pêlên gergîn



Kê reşbelek ji hev
dikir der ?
Kê konê ronahiyê
dinasî ?
Kê reşî bi ronahiyê
xudî dikir ?
Zarokekî sava bûm
Bi xurminiya ewran re
Bi sayê ketim
Bi şîrqîniya burûskan re
Bi ser pêlên ronahiyê
ketim



Min nasî ku ronahiya
Herî xurt ji tariyê
diz e
Hêrsê ewran jî
Bi qêrîniya birûskan
dişk e
û kela xwe
bi ser rûpelên demê de
dirêje
Dibe lêmişt û har dibe
Xwe li tax û kolanan
ba dide !
Talaniya gund û bajaran
dike !
Goştê mirov şîv e
Xwîn jî mey e

Hovên çiyan kedî
        dibin
Mirov li kolanan har
        dibin
Ji mirovetiyê dibin
         kunê xwînê
Loma
berxwedana herî mezin
di nav pêlên gergîn de
              jîn dide...

**20-2-2001**

- Lêmişt: lehî
- Kedî: Mêşen

-Kun: Meşk. gavê Mirov ji mirovekî tijî bûbê yanê Xulî bûbe dibêjin filan ji filanî bûye kunê xwînê.



# çiyano !



## çiyano !

Kengê hûnê strana xwe
bistirên ?
Bi çend hespan
me kir strana we
li sazxin ?!
Bi hespê boz
Bi hespê qir
Bi hespê kumêt
Vekulimîn, vekulimîn
li saz neket !



û nehat stran
ta em ji hemî hespan
ketin ..!!
çiyano !
Îro li pênûsan
siwar dibim
ta xêza notrana we
bikêşim
û saz kim !!
Çima
stirana
bi sed salan di gewriya
me de lal mayî
li saz neketî...?
Geh siwar
Ji hespan diketin

geh hesp
Ji destên siwaran
derdiketin..!!
îro pênûsê min bûye
hespê Ristemê Zal
û cirîtan dide !
Li rûyê rûpelan
rêçên nota serxwebûnê
dajo û dikêşe ...
sînoran dişopîne
ticarî siwarê xwe
winda nake..!!
Wek:
Dapîrên me yên
li tevnan siwar dibûn
û neqş û nîgarên sirûştî
li ser saz dikirin !

***gundê Maratê 2001***



# Kundo. .



## Kundo. .

Dengekî bi rûbet bû
xwe li guhên me badida
Digotin: Kenê çiyan e !
Stiranên çeman e
Bahozeke bahoz
Bi banga pêxemberan re
Ji xewa salan şiyar bûye
Ji nivîna derya bazdaye...!!



Lewra
Çiya dikenin
Çem li saz in
Destanên bav û bapîran
dahola xwe dikutin...!
qet ne digotin
dengekî ne saz e...
wê pê bûka girînokî
li hêviyek kulek siwar kin ... !


Loma
Histirên çiyan
bibûn lêmişt û lehî
em ji saz xistibûn
Bi hezaran gund û mal
Li ber çûn ...!

Hîn jî
ew dengê nesaz
Ji geravek
          bi gûman tê
kok koka bi ber bedena
              çiyan dikeve
              dengê kundekî ye
              bûye Dêwekî kwîr...!
              di kavilên bav û kalan de
              Çûk û tulûr
              Li xwe civan dine
              Nêçîriyê dike.. nêçîrê
û hîn ji doza kavilan
          namîne ...

***2001***



# Nêçîrvaniya hov




## Nêçîrvaniya hov

Hîn bi sîya xwe re
mijûl dibe
Bi bê re bi biskên
xwe dilîze ...
Çav mêrgehên xweşiyê ne
Berê jînê disîng de
xunçe daye
Rû şûva ramûsanên
Zelal e...!!



Rojhilatperweri
Meriv jê koçber dike
Hovîtiya tîbûna rojhilatî jî
diranan tê de tûj dike
û diçirikîne
Dike
Berî ku bi sînahiya
bejna xwe şa bibe
û çavên mêbaziya xwe
kil de . . .
Wek:
Cigareyekê
bê alaf û bê ronahî
di nav pêçiyên xwe de
bişewitine...?

## Evîndarî







## Evîndarî

Ti roj
Ji şuya canê
Evîndaran re
nîn in
Her
roj û katê
canê wan
diçemê hezê de
Li ber kaniya hestan
bi histirên zelal
tên şuştin

***Zîndaneke Helebê***
***2000***

## Mezopotamiya






## Mezopotamiya

Hembêza herdu çeman
Dawa maka ronahiyê
Ew lalbûna navsalî
        di gewriya te de
                pal daye
Kerbûna navsere
        di guhên te de
            nav daye
Xewna şev û rojan
        di hişê te de
            Şax daye


Verşîne teşiya dîrokê
Îro ji tîrêjên roja te...
gelên cihanê
    tevn û dezgeh
        li dar xistine
Neqş û nîgarên xwe
    li ser rêz kirine
Tevde xuliya dîrokê,
    bibîn !
Kuvarkên sergoyê
    şaristaniya xwe
Çawa
Îro di cîhanê de
    bûne dar ... ?
Di bin de
govend û dîlanên
    gumreh
        li darxistine ...

* Gumreh: Şênahî.



û şahînên dadê
    li dar danîne
Împeretorên
    bi diranên şîr
    pê bazirganiya
    xwe dikin ...
û alên rûreşşşş.. reş
Di ezmanê te de
ketine çavên tərêjê
    dipirpirrin
    û li badibin...
Bûne qertel
    û li laşê
    zanava te hêwirîne
Serî bi dûman !

(1) Şahîn: Terezû






Biqetîne vê gerdena
bi gûman
ji stuyê zanava xwe
Vexwe ji kaniya dîrokê
Ta ku
Tu ramanên baskoyî
nefirînî
ji baxê xwe
Nêçîrvan û ne nêçîrvan
negrin û kedî nekin ...
di redekên (1) xwe de
nexemlînin
baskan pê nînin ...
û li ser
daxwaza xwe
nefirînin

**1999**

(1)Redek: Rekeh,Qefes.

# Cûdî





## Cûdî

Cîhan hişk di xew da bû
ji sanciyên* dayîka min
Tofan rabû ... !
Ne guvguva bê bû
Qêre qêra wê bû
bêηιν li ber çikya bû
hawar axê dikir ...!!
*   *   *
Cûdî ji tîrêjên rojê
şîrfiroyê jiyanê mêt
û berxwedana Tofanê kir
ta bi agirê jîyané
ji şîr vebû...!


*Sancî: Êşa zayinê

Di wê  heyamî de
keviran li ser pişta cûdî
xunçe dan
bûn guljiyan ... guljiyan
ne çelmisîn...
bêdengiya cûdî
kerbûna me bû ... !
Bi lalbûna lal
kevir peyivîn…!

*     *      *

Cûdî  !
ji gemiya
ku bi ser pêlên qêrînaiya
dayîka min ketî
ez peya bûm






û pê bi pê
min zimanê latên te pîvan
Cûdî beramberî zimanê
Nûh e !!
Loma
Cîhan tev lal dibe
kevirên cûdî bi ziman
dibin
bi hemî zimanên cîhanê
Çêroka Tofanê distirên
dizanin
ta dûvê jiyanê tê guran
kêlikên li ber serê me
wê heyîna me bipên
û tevrên gorkol rûreş
reş bikin...!



Cûdî !
Roja te ji gemiyê hembêz kirime
min hevdak ji riyên jiyanê
hilqetand !
û di tevna heyînê de
nîgar kir...!
Bi wê nîgarê re
min giyayê Cilgamiş
ji gewriya mar hilkişand
Pê nêza xwe ko kir
û mirina navê xwe
lîwan kir
* * *
Cûdî jînber e
li benda sanciyek nûh

* Liwan: Gem




rûyê xwe kiriye rûpel
û raxistiye
ta ku dîsa
qorên tîpan
lê bihêwirin ...
û kelaya destaneke nûh
lê ava be
bi peyxem û sirûda
nûhjiyanê ...
pêşewaziya
gemiya serdemî bike…!!!

***Heleb***
***14-3-2001***

# Poşmanî






# Poşmanî

Min di jiyana xwe de çi kirî
Jê bi gumanim
ku rojek were
lê poşman bibim
Tenê
min du demjimêr şikandin
ti carî
lê poşman nabim

Yek jê
her ku li hêviya jivana yarê
dimam
giran giran bi qursî
digeriya

ya din jî
her ku bi yarê re diciyyam
pele pele bi lez û bez
digeriya

**Silêmanî 2003**

## *pirtûkên helbestvan çapbûne ev in:*

**1- *çivata kulîlkan***
-şanoya zarokan
-çapa: Beyrot
-ji weşanên:
pirtûkxaneya Bedirxan - Heleb
-sal: 1994

**2- *seyran dil di şîna Evînê de***
-Helbest
-çap: Beyrot
-ji weşanên.
pirtûkxaneya Bedirxan- Heleb
-sal: 1997

***3-çivata kulîlka***
Bi zimanê firancî
-Dibin navê
(L ASSEMBLEE DES FLEURS) de
wergêr. Domînique Fradet
çap. Sal. 2000 Reims. France- Weşanxana Fradet
Di binvê jimarê de ISBN 2-909952-06-1



**4-*Dibin dilovaniya jiyanê de***
-Helbest
-Bi zimanê Kurdî û Erebî
-wergêr: Axîn welat
-pirtûkxana Bedirxan- Heleb
-Sal: destpêka 1999

Gavê merov helbestên. M. Hemo dixwîn, hemdemiyek berz di wan de dibîne.

-Hêjayî gotinê ye em bibêjîn M. Hemo û hin helbestvanên dîtir , bi zortirîn cûreya helbestên xwe berdan pênava tevgera wêjeya Kurdî li sûriyê .

**Rexnevan: Heyder Umer**

**Kovara Nivîs - Alemaniya**

- دعوة صريحة وواضحة من الشاعر محمد حمو الى قيام ثورة أدبية, تحطم القوالب الفنية الموروثة والنمطية التقليدية والخيال المتصخر.

وهي دعوة مفعمة بالتمرد تعرف ان الحداثة لاتولد إلا من رحم الحرية.

الناقد

هوشنك درويش

جريـــد الكفـــاح العربـــي

(بيروت)

جريد الاتحاد (السليمانية)



الشاعر محمد حمو

اثبت ان القضبان الحديدية لم تستطع ان توقف خطواته وبالعكس ان الانسان بأمكانه ان يبدع ويرى مايكتب قلمه رغم الظلام الحالك.. غير مهتماً بنفاذ حبر قلمه يستعمل بدلاً عنه دمه الاحمر في تجربة فريدة من نوعها اجتاحت نمط الشعر الحديث بكلمات قد تغير مستقبلاً أبجدية اللغات لقاموس جديد تفتقر اليه كرتنا الارضية الخضراء .

التشكيلي والشاعر

فلك الدين كاكائي

5/10/2002

لةدواى دةنطى جطةرخويَن و قةدرى جانء عوسمان سةبئ لةكوردستانى سوريادا لةذيَر توندوتيذى ناسيؤنالستى عةرةبدا جوطرافياى ئةدةبى كوردى لةو بةشةى كوردستاندا بؤشاييةكى تيَكةوتء كوردى نووسين قةدةغةكراو نووسةران لةوآ ناضاربوون بةزمانى داطيركةرةكةيان بنووسنء لةو بوارةدا طةلىَ ناوى درةوشاوةى وةكو سةليم بةرةكات هةية.. بةلآم لةم سالآدواييدا لةسايةى طؤرانكارىية جيهانىيةكاندا هةندآ

لةنووسةرانى كوردستانى سوريا ض بةدزى و ض بةئاشكرا كةوتنةوة كوردى نووسينء ئيَستا دةنطةليَكى بةتوانا لةبوارةكانى ئةدةبدا لةو

بةشةى كوردستاندا هةلَكةوتوونء ماموَستا (محمد حمو) ديارترينء طةشترين ناوة لةبوارى شيعرداو شيعرةكانى ئةم شاعيرة بةناخى ميتوَلوَذياى كوردةوارىدا دةضيَتة خوارآ و بةزمانى جةظةنطء هيَماكارىء ئانتوَماييمء بةبآ هاتو هاوار دوور لةدروشمى ديارو زةق بوَمان دةدوآ و بةتوَرى وشةى ئةفسووناوى رامان دةكيَشيَتة ناو تةلارة نهيَنىيةكانى يوَتوَبياى جيهانيَكةوة كة لةسةر نةخشةى جوطرافياى زةوىدا ناوو هةتةرى نية.

شاعير/ لةتيف هةلمةت

تشتآ بالكش ل نك محةمد حةموَ ئةوة كو زمانآ هةلبستيَن وي نةرمة ةظ يةكا ذي د هةلبستا نوو دا خالةكة رخنظان حةيدر عمر

كوظارا هاويبون – ئالمانيا و

دهوك

* تيَكةلأ كردنى خةمء ئةوين, لةئالأ ناسكىء شةفافيةتيَكى بيَويَنةدا. سيماى شيعرةكانى شةم شاعيرة ضياييةن.

ئاوات حةسةن ئةمين

شاعير



**1- Dîsa ………………………………………… 5**
**2- Dayê ……………………………………………7**
**3- Kûraniya vê riyê ……………………….. 10**
**4- Tawanbarim …………………………… 15**
**5- Helbestvano …………………………… 18**
**6- Sersala du hezarî ……………………… 20**
**7- Hevmala min -1- ………………………. 24**
**8- Hevmala min -2- ………………………. 39**
**9- Hevmala min –3- ………………………. 49**
**10- Jiyankwîr ……………………………... 52**
**11- Dildarî ………………………………… 55**
**12- Dilyar …………………………………. 64**
**13- Efrîn …………………………………... 66**
**14- Şahî ……………………………………. 70**
**15- Hunermendo …………………………. 73**
**16- Xuda ……………………………………... 77**
**17- Birîn ……………………………………….88**
**18- Tenahî ……………………………………..82**

**19- Pêlên gergîn ……………………………85**

**20- Çiyano ………………………………..…89**

**21- Kundo ……………………………….93**

**22- Nêçêrvaniya hov ……………………… 97**

**23- Evîndarî ………………………………100**

**24- Mezopotamiya ……………………..102**

**25- Cûdî ………………………………...108**

**26- Poşmanî ………………………………116**